



# Rojek ji zîndana Diyarbekirê ya bi navê “5 nolî”

»»» R:5



## PDKÎ: Em waneya bawer û cangorî- tiyê ji kêmendaman hîn dibin

»»» R:3

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdî](http://www.kurdistanmedia.com/kurdî)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (339)06-12-2018 Buha (1000) Tûmen

## Lihevaliyana bejna çiya û cangorîtiya pêşmerge

»»» R:2



## PDKÎ roja 16'ê Sermawezê weke roja Kê- mendamen vê partiyê destnîşan kir

**P**artiya Demokrat a Kurdistanana Îranê bi armanca emegnasî û rêzgirtin ji tekoşîna kêmendamen xwe, roja 16'ê Sermawezê weke roja Kêmendamen PDKÎ destnîşan kir û di vê derbarê de daxuyaniyek ji bo raya giştî belav kir.

### Daxuyanî wiha ye;

Daxuyaniya Navenda Siyasetî a Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê

Ji bo agehdariya hemû aliyan, kadir, pêşmerge, endamen Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê û bi taybet kêmendamen PDKÎ didin xuyakirin ku ji bo nîşandana emegnasiyê û weke rêzgirtin ji tekoşîna hemû wan hevalên ku di xebata netewî a Kurdan de û di refa xebatkarên partiya me de rastî teror û şewazên din ên pîlanên hovane ên rejîmê hatine yan jî li çeperên berxwedana li hemberî dujminên Kurdan, endamek yan jî hin ji endamen leşê xwe ji dest dane û rastî jiyana kêmendamiyê hatine lê dîsa jî kêmendamiyê nekariye berdewamkirina xebata wan asteng bike û hizra wan a azadîxwaziye û vîna wan xurttir bûye, PDKÎ rojekê weke roja Kêmendamen vê partiyê destnîşan dike.

Tevî ku rêzgirtin ji ew kesên ku cesteyê xwe di refên partiya me de bi gorî kirine, erkê hertimî û rojane ê hemû pêkhatiyên civaka Kurdan û bi taybetî jî Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê ye, lê ji bo ku rojêke destnîşankirî ji bo rêzgirtin ji xebat û tekoşîna wan kesan hebe, roja 16'ê Sermawezê weke roja Kêmendamen Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê destnîşan dikin ku tê de kek mele Hesên Şeweselî hevalê xebatkar û endamê rêberatiya partiya me roja 16'ê Sermawezê sala 1366'an a Rojî di pîlaneke rejîma hov a Komara Îslamî a Îranê de rastî terorê hat û di encamê de piraniya endamen hestiar ên ser û çavên wî rastî ziyane hatin û her du çavên xwe jî ji dest dan.

Destnîşankirina rojekê ji bo nîşandana emegnasiyê û weke rêzgirtin ji tekoşîna wan di refên PDKÎ de tenê aliyekî biçûk ji erkên me li hemberî wan kesan e ku cesteyê xwe ji dest dane. Me li hemberî wan kesan gelek erkên din ên niştîmanî, mirovî û exlaqî jî hene ku pêwîst e wan jî bicî bikin. Em hêvî dikin xebata me serkeve û netewa me bigihe armancên xwe bila êdî xortên Kurd rastî jiyaneke bi vî rengî neyên.

Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê

Navenda Siyasetî

13'ê Sermawezê a sala 1397'an a Rojî

4'ê Kanûna Pêşîn a sala 2018'an a Zayînî

## Rejîma Îranê biryarnameyên Konseya Ewlekariyê binpê dike

**M**ike Pompeo Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê di axavtineke taybet de, careke din bas ji metirsiyên Komara Îslamî kir, û ragehand: “Tehran bi eşkere biryarnameyên Konseya Ewlekariyê ya NY binpê dike, û taqmên terorîstî pîrçêk dike”.

Roja Sêşemiyê 14'ê Sermawezê “Mike Pompeo” di axavtinekê de, di binkeya “Marşal” li Birokselê ragehand: “Komara Îslamî paş “Bercam”ê, venegeriya nav civaka cihanî, û ew pereyê ku di vî warî de bi dest xist, radestî girûpên terorîstî kir”.

Navbirî raeghandiye: “Rejîma Tehranê hevvelatîyên Amerîkayî bi rehîn girtine, û bi eşkere biryarnameyên Konseya Ewlekariyê ya NY binê kirine, û derheq pirograma



navikî derevan dike. Berdewam jî hewl dide tehrîman dewr bide, û di mînaka herî nû de jî, biryarnameya 2231 a Konseya Ewlekariyê bi taqîkirina mûşekên balistîk binpê kiriye”.

Ew axavtina “Mike Pompeo” piştî civîna Konseya Ewlekariyê derheq behs û gengeşeya li ser pirograma mûşekî ya Komara Îslamî bûye, ku tê de, “Nikki Haley” nûnera Amerîkayê di vê konseyê de, bas ji metirsîdarbûna taqîkariyên mûşekî ên Tehranê kiriye, û ragehandiye: “Dûr ji çavni-hêriyê nebû, ku Îran

karekî weha bike”. Herweha got jî: “Civaka cihanî nabe derheq binpêkariyên Komara Îslamî bédeng be, û dibe ew binpêkariyên Tehranê yekdeng û hevhelwest bê mehkûmkirin, û dijkiyara hewce di hember de bigrin pêşiya xwe”.

Hevdem dewleta Amerîkayê biryar daye, di çend rojên bê de, “naw”eke firokehilgir a xwe di nav avên kendawê de cihgir bike. Li gora dawî zanyariyan, ew firokehilgir heya dawiya vê hefteyê wê di nava avên Kendawê de cihgir bin.

**Sergotar**

**Lihevaliyana bejna  
çiya û cangorîtiya  
pêşmerge**

N: Kerîm Perwîzî

**P**êşmerge ew îrade ye, ku ji reh û rîşeya dîroka pîrr ji şanazî ya neteweyekê û bawerîya pîroz ya mirovekê, û hêvî bi siberoja nivşekê ve çavkanî digre. Îradeyeke bi vî rengî ne dikare bikeve qedeman, û ne jî rastî êşa dogmatîzmê tê.

Pêşmerge di nav neteweyekê de serî radike, ku nîştimana wê, bi derba rim û potînan ketiye bin destên deshilateke stemkar, û dengê bilind ê azadîxwaziyê tê de hatiye dîlkin, lewra ew neteweya dixwaze ku nîştimana xwe avedan bike, û bi dengê zelal ê xebatkarî û rizgarî û wekhevîxwaziyê, bingeha siberojeke geş û pêşkevî danê.

Ew neteweya di vî pêxemê de, dehan û sedan sal in ku tekoşînê dike, û qurbanîyê dide, lewra îradeyeke bihêz û nevest di nava nivş bi nivşê vî neteweyê de, bihêz û bihêztir dibe. Ew îrade, îradeyeke derekî nîne, û hilkelîyê nav derûna vî neteweyê ye, lewra bi tu çek û zebr û zextekê ji nav naçe û naherife, û qahîmtir ji caran, û geştir ji qonaxên berê vedigeşe.

Ew îrade ji bejna bilind û pêdagirî û hermana çiya moralê werdigre, û çiya dibe simbol û nîşan bo îradeyeke wisa, ku em dikarin navê îradeyê li ser danên, îradeya qet serînetewandin û neketinê û emegdariyê. Hêma û sembolek ku di çiya de xwe dibîne, dixwaze hawar û dengê dîrokê û heza herman a tambexşîn û jiyaberhemanîne be. Çiya dibe

**PDKÎ pîrozbahî li “Partiya Demokrat a Pêşvero ya Kurd li Sûriyê” kir**



**P**DKÎ derheq bidawîhatina serkevtiyane ya 15. emîn kongireya “Partiya Demokrat a Pêşvero ya Kurd li Sûriyê” serdana vî hizbê kir.

Roja Pêncşemiyê 8`ê Xezelwera 1397`an şandeke PDKÎ bi serperestiya Foad Xakîbêygî nûnerê PDKÎ li bajarê silêmaniyê, bi armanca pîrozbahîgotina bi “Partiya Demokrat a Pêşvero ya Kurd li Sûriyê” derheq bidawîhatina serkevtiyane ya 15. emîn kongireya wan, serdana nûnertiay wê hizbê li Silêmaniyê kir.

Di vî serdanê de, ew şanda PDKÎ ji aliyê heyeteke “Partiya Demokrat a Pêşvero ya Kurd li Sûriyê” bi serperestiya Elî şemdîn endamê Mekteba Siyasî û nûnerê wan li Herêma Kurdistanê ve hate pêşwazîkirin.

Di vî hevdîtinê de şanda hizbê, pîrozbahiyên herî germ ên PDKÎ gotne birêz şemdîn, û hêvî xwastin ku ew serkevtinên zêdetir bi dets bixin. Herweha Elî şemdîn, pêwendiyên dîrokî ên di navbera herdu aliyên de bilind nixanidin, û spasiya PDKÎ kir.

Kongireya 15`emîn ya “Partiya Demokrat a Pêşvero ya Kurd li Sûriyê” rojên 15-16`ê Çiriya Paşîn a 2018`an li bajarê Qamişlo a Kurdistana Rojava hate lidarxistin, û Desteya Kargêrî ya PDKÎ peyameke pîrozbahiyê pêşkêşî kongireya wan kir, ku birêz Hemîd Derwêş sekreterê giştî ê “Partiya Demokrat a Pêşvero ya Kurd li Sûriyê” di nameyeke fermî de spas li Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ kiribû.

sîma û rûçikê biheybet ê îradeya azadî û xweselimandin û jiyane.

Bi vî rengî mirovê Kurd, ew xortên hişyar in ku tep û toza destê nezaniyê û nezanperestiyê û koletiyê davêjin aliyekî, û li dijî mij û dûmana tarîtiyê disekin, û rûçik û navê pêşmerge wekî xelata îradeya neteweyî werdigrin, û dibin bi ewên ku qet nahêne jibîrkirin.

Di vir de ye ku pêşmerge bi hêvîwergirtin û dildana bi heybeta moralbexşîn a çiya dibe evîndarê çiya, û îradeyê jê werdigre, û pêşmerge û çiya li hev dialin, lewra di dîroka vî gelî û vî xebatê de, çiya û pêşmerge wisa li hev dialin, ku li hev nahêne cudakirin, û dema ku navê çiya tînî, pêşmerge tê bîra te, û berevajî jî her wisa ye.

Qonaxa nû ya xebata gelê me, wate “Rasan” pêk tê ji nûbûn, û xwenûkirin, bi awayekî ku ev çîroka dîrokî ya çiya û pêşmerge bibe hêma û nîşanek bo rabûna bajar. Lewra destan û hemaseya herman a çiya û cangorîtiya pêşmerge û nûbûna bajar qet nikarin li rabîhorî de bijîn, û berdewam û berdewam xwe nû dikin, û jiyane berhem tînin.

## PDKÎ: Em waneya bawer û cangorîtiyê ji kêmendaman hîn dibin



**N**avenda Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ji bo rêzgirtin ji malbatên kêmendamen vê partiye û malbatên şehîdan peyamek belav kir.

Peyam wiha ye;

Ji bo rêzgirtin ji kêmendamen partiya me Dîroka tevgera netewî a Kurdan û xebata wan ji bo dabînkirina maf û azadiyan û herwisa ji bo dabînkirina mafên netewî ên Kurdan, evraz û nişîvên curbicur di rûpelên xwe de tomar kirine.

Berdewamiya vê xebat û berxwedanê ku ji vîna neteweyeke mafxwarî û bindest bi xwîna hezaran xebatkarên Kurd rengîn bûye ku wan kesam jiyana xwe di pêxema azadî û mafên neteweya Kurd de gorî kirine û bi vê xwînê, belgeya rewatiya vê xebatê û berheqbûna mafên Kurdan hatiye îmzekirin.

Herwisa bi hezaran xebatkarên neteweya me di qonaxên cuda ên dîroka vê xebat û berxwedanê de rastî tîx û tîr û terora tawanbarên rejîmê hatin û beşek yan jî çendîn endamên cendekê xwe ji dest dan. Mixabin gelek mînak hene û a herî berçav jî teror û

kêmendankirina xebatkar û kesatiyê naskirî ê netewa me kek mela Hesên Şêweselî ye ku bi kêmendamiyê lê bi baweriyê xwe bi rewatiya maf û azadiyên neteweya xwe, jiyaneke ne normal belkî tijî êş û elem derbas dikin.

Taybetmendiya cesteya wan, bandoreke xirab kiriye ser dil û hindirê wan û tenê kêmendamiyê dikarin hest bi van azaran bikin. Piraniya kêmendaman, weke her kesekî din xwediyên jin û zarokan in ku ji ber kêmendamiya cesteyî û rewşa nebaş a hindir, ne dikarin bi awayekî asayî û li gor heza xwe xizmeta malbatê bikin û nikarin wan karan jî encam bidin ku berê ji bo debara jiyana malbatê dikirin û ev jî dil û hindirê wan dêşîne.

Lê dîsa jî bejna xwe li ber vê rewşa dijwar natewînin û bi serberzî, xebat û jiyaneke didomînin. Çi qasî tal e ku heval û hevçeperê mirov yan jî kesekî din ji dîtîne tê bêparkirin. Dunyayê û ruyê zarokên xwe nabîne û bi neçarî, ruxsarê zarokên xwe di mejiyê xwe û alema hindir de bi xeyalan nexşin dike.

Piyên wî tine bin ku bi wan piyan, zarokên xwe hînî rêveçûnê bike. Destên wî tine bin ku bi ser serê zarokên xwe de bikşîne. Di rastî de ew kêmendamiyê hemû van êşan dikşînin û jiyana xwe bi eleman re derbas dikin. Şehîd jî simbol û nîşana cangorîtiyê û xwebexşîna di pêxema neteweyê, ax û xelkê Kurdistanê de ne û lewre pêkhatiyên cuda ên xelkê Kurdistanê di hemberî



### Birêz Mela Hesên Şêweselî qurbaniyê destê terorîstên rejîma Îranê

van cangorîyan de bejna xwe ditewînin û rêzgirtin ji malbatên şehîdan û xizmetkirin bi wan, weke erkên xwe dibînin û weke baştirîn padaş jî, meş û rêbaza wan berdewam dikin.

Li gor heman bingehe jî pêwîst e rêz ji wan kesan bêgirtin ku di pêxema dabînkirina maf û azadiya neteweya Kurd de hin ji endamên leşê wan bûne qurbanî. Rêzgirtin ji wan kêmendaman erke netewî ye. Rast e ku jiyana kêmendaman bi dawî nehateye û ew dikarin bijîn, lê jiyana wan bi jan û êş û eleman re didome û dibe ku êş û elemeke nêzîkî mirinê û a şehîdbûnê bikşînin û careke din ji bo jiyana pirjan a kêmendamiyê dest pê bikin.

Herwisa ne tenê xizmetkirina malbatên kêmendaman erke netewî ye, lê belê erkê mirovî û exlaqî ê hevçeper, hevbîr û hevarmancên wî û tevahiya xelkê Kurdistanê jî ye. Tevî ku di serî de ew erk li ser milên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ne ku li malbatên şehîd û kêmendaman xwedî derkeve, lê ji ber ku erke mirovî,

niştîmanî, exlaqî û şoreşgêriye, hemû pêkhatiyên civakê li xwe digire. Ev kar ne ev e ku dilê mirov ji bo wan bisoje ji ber ku endamên hizbê ji vê mezintir in ku dilê me ji bo wan bisoje lê belê ew cangorî û cestebeşên netewa me ne û divê em waneya bawer û cangorîtiyê ji wan hîn bibin û di heman demê de jî erkên xwe ên niştîmanî, mirovî, exlaqî û şoreşgêriyê bicî bikin û rêzê ji wan bigirin.

Êdî ew dem hatiye ku em sozên xwe li hemberî wan nû bikin û ji wan re bêjin hûn ji bo me mînak cangorîtiyê, wêrekî û bawera xurt a handera derbaskirina rîya dabînkirina armancên me ne û cihê we di gorepana xebatê de xuya ye û hizra we jî rênimûniya me dike. Divê hewl bê dayîn derfet ji bo rêzgirtin û emegnasiyê bê pêkanî û bi bawermendiyê, erkên xwe bicî bikin.

**Navenda Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê**

**10'ê Sermaweza 1397'an a**

**Rojî**

## Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê: Di vê xortên Kurd ên ku xema pirsê Kurd û pêşeroja welat dixwen, piştevaniya Navendê bikin



**N**avenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê di civîna herî dawiyê a xwe de derbarê guhertinên li Kurdistan, Îran û navçeyê nerînên xwe li hev guhertin û spasiya xortên Kurd ji bo xebata bê bêhnvedan kir û ji hemû Kurdan jî xwest piştevaniya Navendê bikin.

**Daxuyanî wiha ye;**

Daxuyaniya Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê Navenda Hevkariyê, roja 3'ê Sermaweza 1397'an a Rojî (24'ê Çiriya Paşîn a 2018'an a Zayînî) civînek bi beşdariya berpîrsên bilind ên partiyên Kurdistanî Îranê bi mêvandariya Partiya Demokrat a Kurdistanî Îranê birêve çû. Destpêkê birêz Mistefa Hicrî Lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanî Îranê bixêrhatina şandeyên beşdar di civînê de kir û civîn bi deqeyek bêdengiyê ji bo rêzgirtinê ji şehîdên vê dawiyê ên Kurdistanî Rojhilat û xebatkarên azadîxwaz ên gelên Îranê dest pê kir.

Lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanî Îranê di gotareke siyasî û giştî de bal kişandê ser rewşa niha a rejîma Komara Îslamî a Îranê, encamên dorpêçên vê dawiyê ên aborî li ser rejîmê, rewşa nebaş a aboriya welat û daketina pêwîstiyên jiyana xelkê, gendeliya malî û givaşên navxwe û derve li hemberî rejîmê.

Got jî ku di vê hevkarîya di navbera partiyên Kurdistanî Îranê de xurttir bibe ji ber ku bandorê dike ser rewşê. Di civînê de behsa kar û çalakiyên Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê, mûşekbarana baregehên wan partiyên û darvekirina hejmarek ji çalakvanên siyasî ên Kurd di meha Xermananê de ji aliyê Ko-

mara Îslamî ve hate kirin.

Herwisa spasiya aliyên beşdar ji bo kar û çalakiyên wan hate kirin û hate gotin ku hevdengî, hevgirtîbûn û hevhelwestiya aliyên siyasî, gireva giştî û dîrokî a 21'ê Xermananê li pey xwe ve anî ku rûpeleke tijî şanazî bû di karnameya xebata Kurdan de li Kurdistanî Îranê.

Di civînê de hemû alî hevhelwest bûn ku divê hevkarî û hevhelwestiya di navbera wan aliyan de berde-wam bike û Navenda Hevkariyê, spasiya xelkê Kurdistanê jî kir ji bo xebata wan û silav û rêzên taybet ji bo girtiyên siyasî û binçavkiriyên vê tevgera hevhelwest a Kurdan şandin ku li hemberî siyaseta zordarane a Komara Îslamî a Îranê xwedî helwest û vîneke şoreşgêrî û xebatkarane bûn.

Di çarçoveya behs û nerînên lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanî Îranê de jî, şandeyên her yek ji endamên Navenda Hevkariyê, nerînên xwe anîn ziman û pêşniyarên xwe ji bo xurtkirina van mijaran vegotin. Encama civînê jî ev bû ku Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê, di kar û çalakiyên xwe de berdewam be û ji bo xurtkirina Navendê, tevahiya şewazên xebata rewşa û serdemiyane li navxwe û dervey welat bêne bikaranîn û hate gotin ku divê xortên Kurd ên ku xema pirsê Kurd û pêşeroja welat dixwen, piştevaniya Navendê bikin û li dijî tepisandin û zordariya rejîmê derkevin.

Di dawiya civînê de biryar hate standin ku Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê hewl bide di heyameke destnîşankirî de pilatforma xwe ji bo pêşatên nû û guhertinên ku têne çaverêkirin li Îranê çê bibin, amade bike û xelkê xebatkar ê Kurd, parti-

yên opozîsyona Îranê û civaka navdewletî ji wan bêne haydarkirin. Ji bo ku ev erk bi awayekî lezgîn bêne encamdan, biryar hate standin ku şandeyên nûnerên Navendê, bi regekî ciddî û bi pêwendiyê nêzîktir bi berpîrsên yekem ên wan partiyên re mikanîzma pêwîst di warên cuda de destnîşan bikin.

Di civînê de her yek ji birêzan kek Umer Êlxanîzade sekreterê giştî ê Komeleya Zehmetkêşên Kurdistanê, kek Mistefa Mewlûdî sekreterê giştî ê Hizba Demokratî Kurdistanê, kek Salih Şerîfî endamê deftera siyasî a Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistanî Îranê bi nûneratî ji aliyê birêz kek Ebdulla Muhtedî sekreterê giştî ê Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistanî Îranê ve, kek seyîd Kamîl Nûranîferd endamê deftera siyasî a Sazmana Xebat a Kurdistanî Îranê bi nûneratî ji aliyê kek Babaşêx Husênî sekreterê giştî ê Sazmana Xebat a Kurdistanî Îranê ve, ku serokatiya şandeyên beşdar di civînê de dikirin, di çarçoveya behs û mijarên civînê de û herwisa ji bo biryar û rasipartiyên Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê guhertinên dawiyê ên pêwendîdarî pirsê Kurd jî şirove kirin û hevdengî û hevhelwestiya Navenda Hevkariyê û hevgotariya tevgera Kurd, bi pêwîst zanîn.

**Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanî Îranê**

**3'ê Sermaweza 1397'an a Rojî  
24'ê Çiriya Paşîn a 2018'an a Zayînî**

### Mamostayekî berê yê fêrgeha PDKÎ çû ber dilovaniya xwe



**M**amosta "Mêhdî Bedrî" mamostayê berê yê fêrgeha PDKÎ çû ber dilovaniya xwe.

Roja Înê, rêkefta 9'ê Sermaweza 1397'an, mamosta "Mêhdî Bedrî", mamostayê xebatkar yê Partiya Demokrat ku zêdeyî 20 salan di nav refên pêşmergên PDKÎ de bû, û wekî mamostayê fêrgehê erka hizbê bi cih digehand, bi sedema nesaxiya şêrpencê li welatê "Danmark"ê çû ser dilovaniya xwe.

Mamosta Mêhdî xortekî çalak û hişyar bû, gellek bilez xwe pêgihand, û bû mamostayê fêrgehê û pila kadriyê wekî mamostayê lêhatî wergirt, û her di vê demê de bû mamostayekî zana û dilsoz û hezkirî ji aliyê hevçeperên xwe ve.

Xwedêjêrazî Mêhdî Bedrî, kurê Elî, xelkê bajarê Pawe, li sala 1348'an, li bajarê Pawe ji dayîk bibû, û xwendina destpêkî û paşnavendî ya xwe her di wî bajarî de tewaw kiribû, û bi sedema hest bi berpîrsayetiya gel û nîştiman, herçend ku bavê wî jî her du çavên xwe ji dest dabûn, di sala 1370'î de, tevî refên pêşmergê PDKÎ bû.

Navbirî heya dawiya jiyana xwe emegdarê rêbaza Partiya Demokrat ma.

Partiya Demokrat a Kurdistanî Îranê tevî, xemgînbûnê derheq jîdestdana xortên qehreman de, sersaxiyê dibêje malbat, xizma û kesûkarên navbirî, û xwe şirikê vê xema van dizane.

## Rojek ji zîndana Diyarbekirê ya bi navê “5 nolî”



**Bûbê Eser**

**D**ema behsa zîndana Diyarbekirê tê kirin, erd û ezman diheje. Zilm û îşkenceyên di wir de hatine kirin, li kampa Hîtlar jî nehatine kirin.

Armanca zîndana Diyarbekirê ew bû ku kurdên welatparêz û şoreşger bikin Tirkên baş!. Lewra ji bilî tirkî hemî zimanên din li wir qedexebûn. Ew qedexebûn ne tenê ji bona girtiyên bû. Kesên dihatin seredana keç û kurên xwe jî, nikaribûn bi kurdî qise bikirana. Ev jî dibû sedem ku gelek dê û bavên nikaribûn bi zarokên xwe re qise bikirana.

Ez jî yek ji wan girtiyên wê zîndanê bûm. Ez rû bi rûyê gelek zilm, zordarî û îşkenceyên polîs û leşkerên Tirk hatibûm. Di bin îşkenceyan de, dilê min disekine, polîs min mirî dizanin, lewra min jî qata çaran davêjin jêr, lê dema ez li ser tirombêla wan dikevim, dilê min ji nû ve lêdide, û ji mirinê xilas dibe.

Piştî hefteyekê min ji nexweşxanê digirin, min dibin cihê îşkence û lêdanê, û li wir ez tiştên polîs ji min dixwazin, nabêjim, vê carê jî nigê min ê çepê dişewitînin. Bi vî halê perîşan min dibin ba dadgêr, û ew jî li gor îfadeya polîsan li ser navê min hazir kiribûn, ez şandim zîndanê.

Heger mirov behsa wê zîndanê bike, hemû ava behran bike hubir, wê têra nivîsandina îşkenceyên wê zîndanê nake.

Her hefte kek û hevjiha min



Erê yadê, roja ku te got, “ez baş im lawoo” min qederê sê sa`etan lêdan û îşkence dîtîn.

dihatin wê zîndanê, da ku hema bi çend xulekan jî be min bibînin. Ji ber ku jin û kekê min bi tirkî dizanî bûn, ku halê min bipirsîn. Rojekê min dît ku tenê dayîka min hatiye seredana min. Ji ber vê min zanî ku dayîka min bi tirkî nizane, û hekî ez bi kurdî bi dayîka xwe re qise bikim, wê him dayîka min û him jî, min îşkencê bikin. Loma min biryara da, ku qet qise nekim. Tenê di nava wan çenk xulekan de li dayîka xwe binêrim

bes e.

Ji ber vê min tenê li dayîka xwe dinêrî û dayîka min jî li min. Tam di wê navberê de dayîka min bi tirkî dibêje:

-Oglum nasilsin (kurê min tu çawa yî?)

Ez fikirîm ku dayîka min bi tirkî hîn bûye, hema min jî bi tirkî li dayîka xwe pirsî:

-Îyiyim ana sen nasilsin (Ez baş im dayê, tu çawa yî?)

Tu nebêje tirkîya dayîka min tenê ew bûye. Lê dema min jê re got; ”Dayê tu çawayî?”, wê nekarî xwe bigire û tirkîya wê jî qediya bû. Ji ber vê hema wê jî bi kurdî li kurê xwe vedigeriya û got:

-Baş im, lawao baş im. Hê gotina wê tam naqediya, Gardiyanên li ber min, hema ez yek car dût xistim, qederê sê sa`etan ez îşkence kirim, û gotin:

-Dayîka te çi got....

-Piştî van salan, dema ez ji zîndanê tîm berdan, dayîka min, min hambêz dike û dibêje:

-Kurê min ma wê roja ez tenê hatibûn dîtina te û hema tu yek ser ji ber çavên min wenda bûyî. Ma te çima weha kir lawoo-

-Erê yadê, roja ku te got, “ez baş im lawoo” min qederê sê sa`etan lêdan û îşkence dîtîn.

Dayîka min bi vê yekê gelekî xemgîn dibe, ez dîsa hambêz kirim, maçî kirim û got:

-Dayîk bi qurban. Ma ez çi bikim lawao, xwedê heqê me ji wan re nehêle. Tirkîya min ew qas bû. Min xwe negirt û bi kurdî bersiva te da. Xwedê destê wan bişkêne, zimanê wan qut bike, çavên wan kor bike. Nahêlin em bi zimanê xwe jî qise bikin.



## Kirîza Sûriyê û pêşeroja gelê Kurd û Kurdistanana Sûriyê



Ebdulazîz Qasim

Mirov nikare bi cuda ji pirsgerêkên herêmî û aloziyên kirîza Sûriyê bi giştî behsa pirsgerêka kurdî li Sûriyê bike, herwisa ku kirîza Sûriyê bûye kirîzeke cihanî û Sûriya bûye meydana bo berjewndî û herwisa çareserkirina nakokiyên navdewletî û helbet çend salên borî ji şerê li Sûriyê ket di bin bandora berjewendiya dewletên herêmî de wek Tirkiyê û Îranê ku digel rejîma Şamê welatên dagirker in û bi tenê jinavbirina gelê kurd li her cihekî di rojev û pîlanên wan de ye.


Di çend salên borî de gelek ziyarên mezin li gelê kurd ketin, bi sedema dijberiya rejîmê bi alîkariya Îranê û rêxistina terorîst ya DAIŞ'ê û girûpên radîkal yê îslamî û erebî ji bo mîletê kurd nikaribe mifayê bibîne ji derfeta guhertin û pêşatên nû di paşeroja Sûriyê de, û herwiha ji ber netebayî û nebûna yekrêziyê di nava mala kurdên Sûriyê de, ev çend salên borî bi diwartirîn sal hatin li ser gelê me ji her demeke din û ev sal ketin di berjewendiya dewletên dagirker û zilhêz de, berevajî berjewendiya tevaya gelên Sûriyê, û bi taybetî gelê kurd hatin, ku tevgera kurdî mixabin nikarî mifayê bibîne ji derfetek wiha tevî ku bi dehan salan kar ji bo qonaxêke wiha dikir, ji ber ji destê hikûmeta dagirker ya Şamê rastî gelek siyasî û pirojeyên jinavbirinê hatibû, û lewra li hêviya rojek wiha bû ku tê de rejîm lawaz bibe, lê mixabin acendeyên herêmî û navdewletî heta niha li hesabê rejîmê û hesabên neyarên Kurdan hatin.

Îro û piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê Artêşa Tirkiyê û çeteyên opozisyona çekdar ve, kurdistanana Sûriyê jî hat parçekirin û rewşa wê ya siyasî jî hate guhertin û

niha pirs kurdistanana Sûriyê belav bûye li ser rojhilata Firatê û rojavayê çemê Firatê, û roj bi roj bandora Tirkiyê bihêztir dibe û li beramberî dagirkirina Efrînê hêzên navdewletî bédeng bûn û ev yek cihê metirsiyek mezin e, nemaze ku Amerîka dixwaze navçeyên Kurdistanê bi navçeyên Ereban ve li Dêrazorê û Reqayê ve girê bide û navê kurdistan nayê bikaranîn, ne di siyaseta PYD de û ne jî ji aliyê Amerîka ku hêzên PYD wek hevpeymanên xwe dibînin, zêdetir ku hîç pênasînek siyasî bi PYD'ê û bi rêveberiya wê ji aliyê Amerîka nehatiye dan!

Li aliyekê din û li ser asta diplomatîk, çî pêşketinek berhest nîne ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, û heta niha îradeyeke cidî ji aliyê Encumena Ewlekariya navdewletî û Netewên Yekgirtî ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê li "Cenevre" peyda nebûye, berevajî vê yekê Rûsiya û Tirkiya û Îran û tevî rejîmê dixwazin "Astana" bikin alternatifek ji bo "Cenevre", û tevî beşdariya şanda Encumena Niştimaniya kurdî di "Cenevre" de, û herwiha di kongirên opozisyona Sûrî de li Erebestana Siûdiyê, lê heta niha tenê şanda kurdî beşdar dibe di nav şanda opozisyonê de, û ji ber ku opozisyona Sûriyê heta radeyek mezin heman boçûn û nêrîna şovîniyê ya rejîma Şamê heye li beramberî pirs kurdî û tevî girêdana wê ya bi Tirkiyê re, lewra opozisyona Sûriyê bi pergale xwe yê niha bûye bargiranî li ser kirîza Sûriyê û bi taybetî jî li ser pirsgerêka kurdî û divê ENKS'ê kar bike ji bo nûnertiya gelê kurd bike wek qebarekî serekî û serbixwe çî di reşnivîsa Makezagonê de û çî di gotûbêj û danûstandinên "Cenevre" de.

Çî dema mirov dibêje ku kirîza Sûriyê ber bi çareseriyê diçe, lê berevajî ber bi aloziyên zêdetir diçe, û rege rêxistina çeteyên DAIŞ'ê ya terorîst yan her rêxistineke hevşeweyê wê careke din dubare bibe û ji bilî hevpeymanîya rejîmê ligel Îranê û milişên Hizbullahê, hemû hevpeymanî-



Claimed borders of Western Kurdistan (Rojava)

yên din li ser erdê sist û lawaz in û nemaze hevpeymanîya di navbera PYD û komên Ereban de ji aliyekê û ji aliyekê din yê di navbera wê û Amerîka de, û herwiha hevpeymanîya di navbera opozisyona Sûrî û Tirkiyê de, û opoziyon û ENKSê de, tevî ku ENKS'ê bi awayekî serbixwe kar dike tevî hewldanên PYD'ê yê li dijî wê ji bo kêmkirina pêgeh û rola wê. Di baweriya min de, ku niha hîç seqayek nîne ji bo rêkeftina ENKS û PYD, û bi rastî ezmûna zêdetir ji 30 salan bi awayekî kurdên Sûriyê bêhêvî dike ji ber PYD her wek PKK çî aliyekê din yê Kurdî ne ligorî îdolojîya xwe qebûl nake, û berevajî dixwaze bi awayekî leşkerî pirsgerêkên xwe bi aliyê din re çareser bike, û zêdetir ku çî armanceke netewî di bername û rojeva wê de nîne û xwe bi Netewa Demokrat binav dike, lewra her rêkeftinek wê çarenivîsa wê wek rêkeftina Hewlêr 1 û 2 û Duhok be, tevî ku ji aliyê Amerîka çî destpêşxeriyek rasteqîn nîne ji bo rêxistina nav mala kurd û xweşkirina pêwendîyan di navbera ENKS û PYD de, û bédengiya wê li hember gefên Tirkiyê ji bo êrîşkirina li ser navçeyên kurdî li rojhilata çemê Firatê û nemaze navçeyên Serêkaniyê heta Dêrikê û ji Qamişlo heta bajarê Hîsiçe bi navçeyek stratejîk tê nasîn.

Ya xuya ye ku kirîza Sûriyê wê ligor berjewendiya Rûsiya û Amerîka û Îsraîlî çareser bibe û dibe hin dewletên din wek Firansa rolek hebe, lê her çawa be îro divê Kurd berjewendiya xwe ligel berjewendiyên Rûsiya û Amerîka biguncînin û heta niha jî hîç nexşeriyek yan demek ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê nehatiye

eşkerakirin. Divê PYD dest berde ji siyasîyên xwe û ligel hemû aliyên kurdî rêk bikeve yan jî dê rastî şikestinek mezintir ji Efrînê bibe û her wek tê zanîn ku armanca Tirkiyê bêhtir ji bo lawazkirina mîletê kurd e û lawazkirina cih û rola Kurdan di paşeroja Sûriyê de ye, nemaze ku rejîma Sûriyê û herwisa Tirkiyê jî agahdar in li ser parçekirina Sûriyê û Tirkiya bi riya peymanî Idlibê, û piştgiriya girûpên çekdar yê îslamî û dagirkirina Efrînê dixwaze xwe bike hevparên Rûsiya û Amerîka, û li dema kurd bi yekrêzi kar bikin wê pêgeha Tirkiyê lawaz bibe, nemaze ku Tirkiya heta niha bi piştgiriya girûpên radîkal yê mîna El-nusra û Ehrar El-şam ya ser bi rêxistina El-qaidê derbas dibe di nav karûbarên Sûriyê de, û bi baweriya min heger Tirkiya bimîne li ser siyasîyên xwe yê ji bo piştgiriya van girûpên radîkal ew jî wê nix û baceke mezin bide, ew jî wek Îranê wê tûşî şikestinek mezin bibe li Sûriyê.

Bi dîtina min lawazkirina rola rejîmê û Tirkiyê û Îranê wê bikeve di berjewendiya gelê kurd di kurdistanana Sûriyê de, û lewra metirsiyek mezin li nik van aliyan heye li ser çareserkirina kirîza Sûriyê û hebûna Amerîka li devera rojhilata çemê Firatê bi giştî û li rojhilata Kurdistanana Sûriyê ji Dêrika hemko heta Kobanê, asoyên geş bo doza kurdî peyda dike, tevî ku heta niha Amerîka bi cidî û fermî piştgiriya xwe ji bo doza Kurdî re îlan nekiriye.

Têbînî: Boçûnên nivîskar, boçûnên şexsî ne, û rojnameya Agirî di hember de berpirsyar nîne

**Nerîna Lîderan**



**Pompeo:**

“Mela tu buhayekî nadin xelkê Îranê de”.




**Sebastian Kurz:**

“Axavtinên Rûhanî li dijî Îsraîlê nahêne qebûlkin”.



**Necmedîn Kerîm:**

“Îbadî êrîş nedikire ser Kerkûkê, hekî zanîba ku Kurd yek e”.



**Zerîf:**

“Welatên Ewropayê sozên xwe neanîne cih”.

**Amerîka dixwaze bibe astengkeke cidî li hemberî destêwerdanên rejîma Îranê di Îraqê de**

Rejîma Îranê ku tu sînorekê bo destêwerdanên xwe di Îraqê de nas nake, kerb û kîna rayedarên Amerîkayê çend hember zêde kiriye, lewra jî Amerîka dixwaze êdî per û baskên rejîmê di Îraqê de bişkîne.

Li gora raporên kongirêsa Amerîkayê terhek peji-randiye ku rejîma Îranê bi sedema destêwerdana di nava karûbarên Îraqê de, tawanbar dike, û daxwaza tehrîmkirina rejîma Îranê kiriye.

Ew terh li jêr navê, pêşgirtina ji têkdana aramiya Îraqê ji aliyê Îranê ve, daxwazkarê wê ye, ku wan rayedarên rejîma Îranê tehrîm bikin, ku aramiya vî welatî dixin tirsê de.

Adam Kîzîncir amadekarê serekî ê vî terhî, di kongiresê de ragehand: Ji dema sernixûniya Sedam Husên ve, rejîma Îranê li pey destêwerdana di nava Îraqê de bûye, ji riya pêkanîna astengiyan ser riya hewlên Amerîkayê bona pêkanîna aramiyê di vî welatî de.

Terhê kîzîncir, serkomarê Amerîkayê erkdar kiriye, ku tehrîma li dijî hemû şexsên xeyrî Îraqî îmza bike, ku li gora gotina wan ewlehiya Îraqê dixwe metirsîyê de. Ew peji-randiya kongiresê heştta nebûye yasa.

Bona guherîna wê bi yasayê, dibe ku çîqa yasadanîne ya kongresa Ameîkayê wate “SINA” terheke weha bipejirîne. Di qonaxa piştî wê jî, dibe ku serkomarê Amerîkayê peji-randiya kongiresê îmza bike.

**El-şerq El-ewset: Îran hewl dide ku demogirafiya navçê biguhere**

El-şerq El-ewsetê ragehandiye ku piroje û pilaneke Îranê heye bona guherîna demogirafiya hindê herêmên Sûriyê.

Rojnameya El-şerq El-ewset derheq destêwerdanên rejîma Îranê di nava karûbarên herêmê de ragehandiye ku hewleke din heye bona guherîna demogirafiya hinek herêmên Sûriyê.

Rejîma Îranê di vî çarçoveyê de hewl dide ku bi piştgiriya rejîma Esed, belgeyên mafê hevvelatîbûnê bide wan çekdarên ku ser bi Spaha Pasdaran û Hizbullahê bûn.

Ji wê demê ve ku rejîma Îranê ketiye nav xaka Sûriyê de, hewl dide pêgeha xwe li wir bihêz bike, û piştî şer jî bikare li wir bimîne. Di van dawiyane de bi hevkarîya Beşar Esed hinek pîlan darêtine ku ciyê kesên awarebûyî ên dijberî Beşar Esed bi Hizbullahê û çekdarên Spaha Pasdaran teji bikin.

Her li gora vî raporê heya niha mafê hevvelatîbûnê bi milyonan Îranî û Lubnaniyan hatiye dan ku endamên Hizbullahê û Spaha pasdaran di nav wan de ne.

Roja 7`ê Novembarê jî nameyê belav bû ku li gora wê nameyê, serokê Saziya Îtîla`ata Giştî ya Sûriyê, bo Wezîrê Navxwe nivîsandibû. Di vî nameyê de rêzbandek ji navê wan Îraniyan hebû ku diviya di parêzgehên Demişq, Rif Demişq, Heleb û Dêr El-zorê mafê hevvelatîbûnê wer-girtiban.

Li gora van raporên ku belav dibin, rejîma Îranê dixwaze ku piştî dana mafê hevvelatîbûnê bi wan kesan, malbatên wan jî bînin nava Sûriyê, û hem jî hebûna endamên xwe (piştî pêdagiriya zêde ya civaka cîhanî li ser bicihlêlana Sûriyê) veşêrin.

**HDP dixwaze bûyera Roboskiyê bixe rojevê de**

Serbarê vî ku eva nêzî heft salan e, bi ser bûyera dilêş ya Roboskiyê re derbas dibe, lê heya niha jî Sencamderên wê bûyerê nehatine eşkerekirin.

Di roja 28`ê Kanûna Pêşîn de, wê heft salên tewaw bi ser bûyera hovane ya perçe-perçekirina laşê 34 Kurd re derbas bibe, lê heta niha jî hikûmeta Tirkiyê encamderên vî cinayetê radestî dadgehê nekirine, û vî yekê hêrsa her mirovekî xwedîvijdan çend hember kiriye.

Di vî çarçoveyê de, HDP`ê bi pêkanîna heyetekê dixwaze cardin vî bûyerê têxe rojevê de, û daxwaza eşkerekirin, destbiserkirin û dadgehîkirina encamderên vî cinayetê bike.

Di 28.12.2011`an de, 34 hevvelatîyên Kurd ku piraniya wan temenekî biçûk hebûn, di şeveke sîrr û sar ya zivistanê de, bi bombebarana hêza esmanî ya Tirkiyê hatin kuştin, û termên wan hatin hincî-hincîkirin, û piştî derbazbûna şeş salan bi ser vî bûyerê re, heya niha jî tu kes li ser vî dosiyeyê nehatiye cezakirin.

Niha jî parêzerên vî dosiyeyê nekarîne ku hikûmeta Tirkiyê razî bikin bi vekirîhêlana destên dadweran bo lêkolîna li ser vî bûyerê, jiber ku dadgehê arteşa vî welatî wekî tawanbar nedaye zanîn, û dosiye daxistiye. Lewra parêzerên wê dosiyeyê dibêjin: “Sîstema dadweriya Tirkiyê heya 20 salên din jî nikare dadperwer be”.

Herçend dadgeha bilind ya YE jî, ji vî xemsa û zulma hikûmeta Tirkiyê hatiye agehdarkirin, û malbatên qurbaniyên Roboskiyê bi piştgiriya gelê xwe û bi riyên medenî û aşîxwazane gellek zext xistine ser aliyên pêwendîdar, lê dîsan jî hikûmeta Tirkiyê naxwaze bi dadgehîkirina bikeran, dilê malbatên qurbaniyan hêsayî û aram bike.

## Şerê Komara Îslamî ya Îranê li Dijî Zanistê, Şerekî Torandî ye



N: Jason Rezaian

W ji Îngilîzî ve: **Hemîd Muxtarî**

Parêzerên jîngehê li Îranê vê dawiyê bûne amancên tund yên girûpek bihêz, lê tirsinok û nexweş di nav komara Îslamî ya Îranê de. Wate desthilatdarên ku bawermend in, her cure pêşkevînek di warên cur bi cur yên zanistî de, metirsî ye li ser ewlehiya Komara Îslamî ya Îranê.

Êrîşa li dijî zanistê, yek ji wan êrîşên herî bê binema û pûç e ku ji aliyê tundrewên nav rejîma Îranê de, heta niha hatiye encamdan. Di despêka îsal de çendîn parêzerên jîngehê hatine girtin. Yek ji wan Kavûs Seyêd Emamî, xwediyê regeznameya Îranî-Kanadayî bû ku piştî çendîn hefteyan di destbisergehên rejîmê de, bi terzek cihê şik û gumanê canê xwe ji dest da. Mirina Kavûs bû sedema nerazîbûnek zaf di asta cihanî de. Herçend desthilatdarên Komara Îslamî yên Îranê ragihandin ku navbirî bi xwe dawî bi jiyana xwe aniye, lê heta niha îdî aya wan nehatiye piştrastkirin. Rejîma Îranê heta rê nade hevîna wî ku jî Îranê derkeve.

Ji aliyekî din ve hêj çendîn jîngehparêz din ku ligel Seyêd Îmamî hatibûn destbiserkirin, li pişt mîleyên zîndanê de ne û niha saziyek cihanî û navdar ya jîngehparêziyê bi rêveberiya “Can



### Gellek sozên ku Ruhanî dabûn, nehatin cih, bitaybetî pirsar paras-tina jîngehê

Godal”, daxwaz azadkirina wan, li hikûmeta Îranê dike.

Jîngehparên zîndanî bi buxtana hewildan bo bidestxistina zaniyariyan li ser bernameyên mûşekî yên balestîk li Îranê ji bo “CIA” û “Mûsad”ê, ji rêka bikaranîna kamêrayên çavdêriyê (ku taybet e bo çavdêrî kirin li ser heywan û candarên ku metirsiya jinavçûnê li ser wan heye, weke pilingê asiyayî) hatine zîndanîkirin.

Buxtanek ku ne tîne nahê bawerkirin, belku gellek zarokane û ehmeqane ye. Buxtanên ku her dem ji aliyê tundrewên nav komara Îslamî ya Îranê de bo destbiserkirina xelkê tê bikaranîn. Vekirina Keysên han li dijî jîngehparêzan, yek ji hewlên wê

dawiyê yên dezgeha zaniyarî ya ser bi Spaha Pasdarên Komara Îslamî ya Îranê ye. Cînahek ku di destbiserkirina min, welatîyên Îranî-biyaî, rojnamevanan, mamostayan û heta dîplomatên Îranê û berpîrsên berê yên rejîmê de rolek mezin hebûne, û bûye sedema jordeçûna astê şerekî îlanekirî li dijî pirsîyarên me, û lêkolînên zanistî yên zanayan.

Îran ligel kirîzeke mezin bi navê kirîza sirûştê û hişksaliyê berbirû ye ku îdî haşa jê nahê kirin. Pirsar kênavî, guhertina rêveva rûbaran, hişkbûna behrên ku ji bo avedaniyê li Îranê dihatin bikaranîn, çendîn sal e ku welat rûbirûyê kirîzek mezin kiriye, û niha jî rêveberiyek natendirust û şaş, bûye sedema çêbûna deştên

hişk yên mezin û pan di welat de. Xelkê Îran îro rojê şahidê bahozên tep û toz û pîsbûna hewa li seranserê Îranê de ne.

Melayên Îranê gellek caran di cihên giştî de, sedema wan bûyeran û bûyerên din yên sirûştî, weke erdhejîne, vedigerînin ser tûrebûna xwedê ji xelkê, bitaybetî jinên Îranê û nerînen wan yên sekular û Ewrûpiyane.

Bi baweriya piraniya zanayên zanistê yên cihanê, sedema şerekî ya hişksaliyê di Îranê de, di gava yekem de rêveberên Îranê ne, di gava duyem de jî hebûna fîsad û rêveberiyek natendirust e di welat de, ku rewş aloztir kiriye.

Gellek sozên ku Ruhanî dabûn, nehatin cih, bitaybetî pirsar paras-tina jîngehê. Niha jî pirsên weke ragirtina parêzerên bê guneh yên sirûştê di destbisergeh û girtîgehên de, bi buxtanên ku renge bibe sedema îdamkirina wan, hemû vê rastiye derdixin ku mana rejîma Îranê, ji bo berpîrsên vê rejîmê, serwey her tişteke din e.

Eva şerê “fersayêşî” ye ku li dirêjheyam de, quldirên mirovkuj yên rejîmê nikarin tê de serbikewin. Pirsar jîngeh tenê bi alîkariya pisporên jîngehê û rêveberiyek dirust ku di dema niha de Îran jê bêpar e, tê çareserkirin. Di dawiyê de rejîma Îranê wê neçar bibe rê ji bo parêzer û şarezayên jîngehê bitaybetî yên ku li dervey welat de dijîn, veke.

Heta ku rejîm mecûbr dibe vê rastiye qebûl bike, ev şera bê sûd û bê mana, wê gellek qurbanî û bandorên kavilker yên dirêjheyam li pişt xwe bi cih bihêle. Bandorên ku wê Îranê, weke welatek kavil lê bike, ku jiyankirin tê de wê pir zor û zehmet be.

### Mamostayekî ayînî ê bajarê “Bane” hate destbiserkirin

Mamostayekî ayînî xelkê bajarê “Bane” ji aliyê Hêzên Îtîla`ata Rejîma Îranê ve hat destbiserkirin, navbirî piştî destbiserkirinê veguhastin bo girtîgeha Îtîla`ata wî bajarî.

Roja Yekşemî 11-ê Sermawezê,

“Mamosta Ebdulbaqî Se`îdî” pêşniwêjê pêştir ê mizgefta “Terxanawa” ya Bane ji aliyê Hêza Îtîla`atê ve hate destbiserkirin, û piştê veguhastin bo girtîgeha Îdareya Îtîla`ata bajarê Bane.

Ev mamostayê ayînî di niwêja Îne de, roja 9-ê Sermawezê 1397-an, derheq kuştina

kolberên Kurd nerizayetî derbirî, û gazinde li siyasatên rejîma Îranê kir.

“Mamosta Ebdulbaqî Se`îdî” pêştir jî bi sedema gilî û gazindekirin li siyasatên rejîma Îranê ji pêşniwêjiya mizgefta “Terxanawa” hatibû vêdebirin.

Bi gotina çend çavkaniyê haydar, navbirî niha di girtîgeha Îdara Îtîla`ata bajarê Bane de ye, û heya niha çî zaniyariyek li ser rewşa wî Mamostayî li ber dest de nine.





## Rewşa aboriya Tirkîyê wê ber bi xirabiyê ve here

**K**arnasên aboriya rewşa aboriya Tirkîyê di pêşerojê de baş nabînin.

Li gora rapora radyoya "Peyamya Îsraîlê", karnasên aborî radigehînin ku di mehên dawiyê de, rewşa aboriya Tirkîyê nebaş e, û kêmiya mewadên xwarinên tê hestpêkirin, û hetîşt jîrojane girandibin.

Ewkarnas dibêjin ku sedem jî ew e ku sermayedar sermaye û pirojeyên xwe ji Tirkîyê vedikişînin.

Ragehandinên Tirkîyê jî dinivîsin ku rewşa aboriya Tirkîyê wisa ye, ku "Erdoxan" bona pêşgirtina ji bilindbûna nirxan, hewl dide ku cotkaran neçar bike ku di cî de berhemên xwe bişînin bo bazarê, ne eva ku di enbaran de ragirin.

"Erdoxan" di van salên dawiyê de, rastî kêşeyan digel gellek ji welatên Rojavayî bûye, û pêwendiya wê bi Îsraîlê re jî gellek alozbûye, û vê yekê derbe li aboriya Tirkîyê xistiye. Herwisa hebûna gendeliya malî jî di nav dezgehên hikûmetî de, û bînpêkirina mafê hevvelatiyan, sedemeke din ya hebûna kirîzên aborî ye.

Serjimêriya aborî nîşandide ku giraniya nirxan di Tirkîyê de, di du mehên borî de, gihîştîye %25, û Lîrê Tirkîyê jî %40 ji buhaya xwe ji dest dabû.

## Romaneke Ferhad Pîrbal li Îranê hat qedexekirin

**R**omana Ferhad Pîrbal, Hotel Ewropa li Îranê hat qedexekirin ku sansur li ser hatiye kirin û rê nehatiye dayîn ku bi Farisî were belavkirin.

Ferhad Pîrbal li ser qedexekirina pirtûka wî ya Hotel Ewropa, ji Rûdawê re ragihand: "Romana Hotel Ewropa piştî ku ji wergêrekî ve bo Farisî hat wergerandin, li Îranê sansur li ser

hat kirin û çapkirin û belavkirina wê hat qedexekirin." Pîrbal diyar kir, ji ber ku romana Hotel Ewropa behsa melayekî Şîe yê Îranî yê li Parîsê dike, diyar e karaktera mela li cem Îranê guncaw nebû, lewma nehiştin bi zimanê Farisî were çapkirin û belavkirin. Ferhad Pîrbal dibêje, piştî ku pirtûka wî li Îranê hat qedexekirin, çend wergêran soz dane ku li Swêdê bikin Farisî û li wir belav bikin.

Herwiha got ku di demeke nêz de serdana Fransayê dike, ji ber ku li Parîsê navendeke diyar a çap û weşanê, soza çapkirina pirtûkeke wî daye û wî jî ji bo çapkirinê, pirtûka Hotel Ewropayê destnîşan kiriye daku bo zimanê Fransî were wergerandin.

Hêjayî gotinê ye ku pirtûka Hotel Ewropa ya Ferhad Pîrbal, bo zaravayê Kurmancî hatiye wergerandin û ji aliyê weşanxaneyê Avesta ve hatiye çapkirin û belavkirin

## Nirxa avahiyan di Îranê de girantir dibe

**N**irxa avahiyan di Îranê de rojane giran dibe, û ew yek bûye sedema rûkirina xelkê bo derveyî bajarên mezin.

Li gora raporê, navgîna mêtreyê çargoşe ya yekîneyê avahiyan (wahidê meskûnî) di Tehranê de, di Xezelwera îsal de, li çav sala borî %91.5 zêde bûye.

Li ser bîngeha rapora Banka Navendî ya Îranê zêdetirîn radeya

zêdebûna nirxan di navçeya 9 ya Tehranê de bûye ku %111 e, û kêmtirîn nirx jî di navçeya 19 ya Tehranê de bûye, ku ew jî %42.2 bûye.

Li ser bîngeha vê navgîna nirxa avahiyan, nirxa mêtreyê çarçar ya yekîneyê avahiyan (wahidê meskûnî) di Tehranê de, Xezelwera îsal 9 milyon û 180 hezar Tûmen e.

Her di vê derheqê de, serokê Saziya Perwerdehiya parêzgeha Elborzê jî ragehandiyê ku hejmara dersxwanan di Elborzê de zêde bûye, û ew yek nîşana koçerbûna berev cihên din e.

Her li ser bîngeh amara Banka Navendî ya Îranê, kirîya avahiyan jî li çav sala borî %17 girantir bûye.



## Nêzî ji %22 ji zarok û nûciwanan kêşeyên reftarî hene

**R**ewanpizîşkekê ragehandiyê ku nêzî %22 ji zarok û nûciwanan di Îranê de kêşeyên reftarî hene.

Dr. Mihemedriza Mihemdî roja Yekşemiyê ragehand: Asta kêşeyên reftarî di nav zarokan û nûciwanan kur ên di navbera 6-8 salî de %24, û di nava keçan de %20 e. Herwisa heman kêşeyên reftarî di nava temenên 6-9 de %22, û di nava temenên 10-14 de 23 ye. Wî raghand kêşeyên reftarî di nava girûpa temen ya 15-17 saliyê de, di nava keç û kuran de, bi sedema dewraneke pêgihîştinê %21 kêmtir dibe.

Wî herweha derbarê rûniştîyên gund û bajaran de jî ragehand ku heman serjimêrî di nava civaka bajarî de %23, û di nav gundan de nêzî %18 ye.

Li gora gotina navbirî, kêşeyên strês û dilekutê û nîgeraniyê di nav keçan de %14 ye, ku asta herî jor ya kêşeyên reftraî û strêsê ye.

Ew rewanpizîşk bas ji vê dike ku hinek ji dê û bavan, vê kêşeya reftarî di zarokan de asayî û xwezayî dibînin, lê berevajî digel geşekirina zarokan, ew kêşeya reftarî jî geşe dike û zêde dibe. Lewra di dema zarokatiyê de, hewldan bo çareseriyê dikare zarokan ji kêşeyên meztir biparêze.



## Keça 17 salî li ser zarokên Kurdên Êzidî pirtûkek nivîsand

**B**avê Şem Berhem rojnamevan e û diya wê jî berê bêjera televîzyonê bûye û niha jî di piraniya boneyên fermî yên Herêma Kurdistanê de pêşkêşkar e.

Şem Berhem ji zaroktiya xwe ve ji xwendin û nivîsandina çîrokan hez dike, zimanê Îngilîzî baş dizane. Roja 13ê vê mehê li bajarê Hewlêrê, di merasîmekê de yekemîn pirtûka xwe ya bi zimanê Îngilîzî yê bi navê "Your are just watching (Hûn tenê temaşe dikin)" belav kir.

Şem ku keça Berhem Elî û Naz Ebdullah e, derbarê pirtûka xwe de ji Rûdawê re ragihand: "Pirtûka min çîroka 10 zarokên Kurdên Êzidî ku ji destê DAIŞê rizgar bûne vedibêje, ew zarok li cem DAIŞê bûn û piştê rizgar bûne, çîrok bi zarê zarokan hatiye vegotin, anku dema tu pirtûkê bixwînî, zarok bi xwe behsa wê yekê dikin ku karên gelek dijwar bi wan hatine kirin, weke mînak; ew kirine çekdar, hinek ji wan xelkê wan li ber wan hatine serjêkirin, çîrokên ciyawaz ên trajedî û balkêş têde hene."


Şem Berhem bêhtirî salekê ye bi nivîsandina wê pirtûka xwe ve mijûl bû, serdana wan zarokên

ku jê re axivîne kiriye, ew dibêje: "Min serdana kampan kir û min çîrokên wan guhdarî kir, zarok gelek wêrek û çavnetirs in, ez li nav kampan geriyam, çîrokên hemû zarokên ku ji destê DAIŞê rizgar bûne balkêş in, lê min 10 çîrokên herî balkêş hilbijartin."

Nivîskara ciwan Şem dibêje: "Min nedixwest pirtûka min a yekem bi zimanê Îngilîzî çîrokeke trajediyê be, lê hûn jî dizanin tiştên ku hatin serê Kurdên Êzidî em hemû xemgîn kirin, lewma min biryar da pirtûkekê amade bikim. Dayîk û bavê min gelek alîkariya min kirin daku ez çap bikim, wan got ev pirtûk dê bibe belge û dokument."

Pirtûka Your are just watching (Hûn tenê temaşe dikin) 10 çîrokan li xwe digre û her çîrokek navekî wê heye ku navên wan jî serpêhatiyên zarokan hatine wergirtin.

Li ser pirsê "gelo ji ber çi tenê çîrokên zarokan di pirtûkê de cih digrin?" Şem Berhem diyar kir: "Li medyayê giringiyeke mezin bi karesata Kurdên Êzidî hatiye dayîn, lê karekî wisa li ser zarokên qurbanî nehatiye kirin, ez bi xwe jî temenê min biçûk e û 17 salî me, lewma min bala xwe tenê



da ser zarokên Kurdên Êzidî."

Dahata pirtûkê ji wan 10 zarokan re ye. Buhayê pirtûkê tenê pênc dolar e. Şem Berhem dibêje: "Cara ewil dema wergirtina çîrokên wan ez destvala çûbûm cem wan zarokan, lê vê carê ku diçim destê min tije ye, ji ber ku temamê dahata firotina pirtûka min ji wan 10 zarokên Kurdên Êzidî re ye ku çîrokên wan di nav pirtûka min de ne."

Pirtûka Şem ku bi zimanê Îngilîzî ye, bo konsulxaneyên çendîn welatên cîhanê yên li Hewlêr û li Bexdayê hatine şandin, di merasîma nasandina pirtûkê de jî wan kesayetên biyanî yên ku li Kurd-

istanê dijîn hatine vexwendin, ji ber ku Şem dixwaze pirtûka wî bigihîje hemû cîhanê û bibeje "Bibînin zarokên we çawa dijîn û zarokên me çawa mezin dibin".

Li ser nivîsandina pirtûkê bi zimanê Îngilîzî, Şem dibêje: "Destpêkê min wisa difikirî ku ez pirtûka xwe bi zimanê Kurdî binivîsim, lê belê piştê min got ku em Kurd gelek tişt derbarê zilma DAIŞê de dizanin, gelek pirtûkên din jî bi zimanê Kurdî derbarê DAIŞê û Kurdên Êzidî de hatine nivîsandin, lewma min biryar da ku pirtûka min bi zimanê Îngilîzî be, daku cîhana derve bi zimanê zarokên xwe wan çîrokan bixwînin."

## Civata Nivîserên Îranê li ser sansorên rejîmê daxûyanîyek belav kir

**C**ivata Nivîserên Îranê bi boneya roja berbirûbûna sansorê, li ser sansora zêde ji qas, a rejîmê daxûyanîyek belav kir.

Civata Nivîserên Îranê, roja Yekşemî 11-ê Sermawezê 1397-an, bi boneya 13-ê Sermawezê ku bi roja berbirûbûna sansorê hate destnîşankirin û hevdem digel 20. emîn salvegera zincîre tawanên reşekujî ên rejîmê û kuştina "Mihemed Muxtarî" û "Mihemed Ce'ifer Pûyende" du endamên çalak yên wê civatê, li ser sansorên be sînor ên rejîma Îranê di hemû warekê de, daxûyanîyek belav kir.

Di vê daxûyanîyê de îşare bi vê yekê hat kirin ku di gel serkuta xelkên nerazî ên Îranê ji aliyê demûdezhgehên Rejîma Komara Îslamî û sansorên dengê nerazî, dengên nerizayetî eşkeretir û tundtir bûne, bixasmanî di wan salên dawiyê de, heta dengê nerizayetiyê ji aliyê nivîseran û hunermendên qata parêzekar ve jî tê bîstin.

Di daxûyanîya Civata Nivîserên Îranê de, ku bi

boneya dehemîn salvegera berbirûbûna sansorê hatiye belavkirin, hatiye nivîsandin: "Yek ji peyamên herî xirap ên ew hemû gef, qedexekirin, çavdêrî, pêdeçûn û hwd..., eva ye ku ewane hemû xwesansor an sansorên derûnî ne, û her şêwe sansoreke fermî an nafermî, bandora nerînê û xirap li ser derûn, bîrkirin, ziman, pêwendiyên ferhengî û civakî ên mirov dibe".

Di beşekî dina wê daxûyanîyê de li ser rewşa sansorên rejîmê û dijsansoriyê di civaka Îranê de hatiye: "Sansora fermî û nafermî bi her awayekî gefek be bo ser azadiya ramanê, dibe bi kiriyar di nava civakê de bêne jinavbirin û hevdem azadiya ramanê bi bê çî rêgirî û têbîniyekê, dibe bê yasayîkirin.



Di beşa dawîya vê daxûyanîyê de jî daxwaz ji hemû hunermendan, nivîseran û hemû qatên ku li dijî sansorê di civaka Îranê de ne hatiye kirin, heya roja 13-ê Sermawezê bîranîna roja berbirûbûna sansorê, bi hemû awayekî têbikoşin, û ew roja li cîhana rastiyê û hemû torên civakî de bibe roja dijberên sansorê û dijberî digel sansorê.

## Zimanê Kurdî

Cînavên koma (min) jî, di hevokan de dibin kara û berkar: (kara) :

- Min tu dîtî
- Te Mizgîn dît

(berkar):

- Ew te dibîne
- Hûn wan dibînin
- Tu ji min re dibêjî (Dom heye)

Têbînî :

1- Dirust e ku çend kar (kirin) bi cînavê kesî tenê

re hevokeke watedar ava bikin :

- Ez hatim û çûm bê ku kes min bibîne.

2- Gelek caran karek tenê jî, bi çend cînavan re

hevokeke watedar dirust dike :

- Ez û hûn û ew, em çûn gulistanê.

3- Heger gelek cînav bi karekî tenê re hatin û yek ji

wan cînavê peyiver (ez) be, hingê ew kar xwe dide ber cînavê Peyiver ê pirjimar (em) :

- Ez û tu û ew, em hatin .
- Tu û ew û ez, em hatin .

Cînavê (ez) digel navan jî, herî bi wî şeweyî hevokê saz dike :

- Ez û birayên xwe û Zîn, em hatin .

4- Lê ku cînavê (ez) ne di nav wan cînavan de be,

hingê cînavê guhdar (tu) bi wê rolê radibe û karê hevokê, xwe dide ber cînavê pirjimar (hûn) :

- Tu û ew, hûn çûn gulistanê .
- Ew û tu, hûn çûn gulistanê .
- Tu û Zîn û Elî, hûn çûn dibistanê .

5- Bi egera sivikbûna gotinê, gelek caran cînavên

kesî jî hevokan dikevin û kar (kirin) bi tenê dimînin bêyî ku çi ziyar bighêje avahiya hevokan, yan watedariya wan :

- Ez li wî digirim

(...li wî digirim)

Ev rawe bi pirranî di bersiva pirsiyarê de tê :

- Tu li kû bûyî (bû) ?

- (... li malê bûm).

Ji ber ku cînav di pirsiyarê de eşkera bûye, nema hêja ye ku di bersivê de jî dúbare bibe.

Yek ji taybetiyên zimanan ew e, ku çî zimanê heye, bi demê re ber bi sivikbûn û şayikbûnê ve diçe . Di stiran û dîlokên folklora kurdî de, ev diyardeya sivikbûnê gelekî berçav dibe.

Wek :

“.....Welle govend ranabe

Xwelî l' mêrê xerab be ..... wiha hat û wiha çû siwar hat û peya çû”( ) Di vê dîlokê de, cînavê (ew) ku cihê (mêrê xerab) digre, gerek li pêşiya van karan (hat û çû, siwar hat, peya çû) bi nav bibûya. Lê ji ber ku watedariya dîlokê (bêyî wî cînavî jî) zelal e, ew cînav hatiye avêtin. B- koma (Min) :

Cînavên koma (Min) ev in : (Min, te, wî, wê, me, we, wan) Ev cînav li gora cîgirtina navên kesan dibin (3) beş: a- (Min, Me) :Cînavên kesê yekem ê peyiver in

- Min : Bo kesê peyiver ê yekjimara her dû zayendan e (nêr û mê)

Wek :

- Azad dibêje, min pertûk xwendibû .
- Zîn dibêje, min pertûk nexwendibû .
- Me : Bo kesên peyiver ên pirjimara her dû zayendan e

Wek :

- Kurd dibêjin, zimanê me hebûna me ye .
- Keç dibêjin, welatê me dayika me ye .

b- (Te, We) : Cînavên kesê dûwem ê guhdar in.

- Te : Bo kesê guhdar ê yekjimara her dû zayendan e.

Wek :

- Azado, te birayê xwe bir malê ?
- Zînê, dayika te gazî te dike !

We : Bo kesên guhdar ên pirjimara her dû zayendan e Wek :

- Gelî xoratn, ma we dara gezê dîtiye ?
- gelî keçan, we karê xwe kiriye ?

**Dom heye...**

# Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ [www.Kurdistanmedia.com](http://www.Kurdistanmedia.com)
- ◆ [www.Agirimedia.org](http://www.Agirimedia.org)
- ◆ [rojnamaagiri@gmail.com](mailto:rojnamaagiri@gmail.com)
- ◆ [www.facebook.com/Agirikirmanji](https://www.facebook.com/Agirikirmanji)

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: [Agiri2003@gmail.com](mailto:Agiri2003@gmail.com)


Hejmar (339)



## Pêşmerge

sirûd e,

bi mergê jînê tê nivîsandin



## Pêşmerge

di hemberî destdirêjkarên de bi vî  
û îradeyeke hesinîn ve sekini ye